

PÊŞNÎYARÊN OSLO DÎ HEQÊ MAFÊN ZIMANÎ YÊN HÛRGELÊN NETEWÎ DE Û NÎŞEYÊ AGAHDARÎYÊ

Sibat 1998

Rêxistina Parastin û Hevkarîyê li Ewrûpa (RPHE) di biryarên xwe yên Helsînkî ya Tîrmeha sala 1992 de nîşan da ku, rola Komîserîya Bilind ya Hûrgelên Netewî bibe haletê ku bikaribe di demeke herî zûtirîn de pêşî li dijayetîyan bigre. Ev biryara hanê, bi taybetî jî ber tesîra rewşa Yugoslavyaya berê bû, ku tirs hebû li cîyên dinê yê Ewrûpa jî tiştên hanê dubare bibin, bi taybetî li wan welatên ku teze derbazî demokrasîyê dibin, û zirarê bidine doza aşîtî û serfirazîyê ku Serokên Dewlet û Hukumetan jî bo Ewrûpayeke Nû dabûne pêşîya xwe di Çirîya Paşîn a sala 1990 di Senedê Parîsê de.

Di Çileyê Paşîn sala 1993 de birêz Max van der Stoel cara pêşîn wek Komîserê Bilind ê Hûrgelên Netewî (KBHN) yê RPHE dest bi karê xwe kir. Birêz van der Stoel, di saya tecrubeya xwe ya mezin wek Endamê Berê yê Parlamenê, Wezîrê Derva yê Hollandê, Nûnerê Daîmî yê Hollandê li Milletên Yekbûyî û parêzgerê mafên mirovî bi salan, bala xwe da ser gelek dijayetîyên di navbera hûrgelan û hukumetên merkezî de li Ewrûpa, ku gor raya wî, dikaribûn germ bin. KBHN, bi karanîna rê olaxên dîplomatîk, bi welatan jêre mijûl bû: Albanîya, Xirwatîstan, Estonya, Macarîstan, Kazakîstan, Kirgizîstan, Latvîya, Makedonya ya Komara Yugoslavya ya Berê, Romanya, Slovakîya û Ukrayîna jî hebûn. Xebata wî berê li ser rewşên hûrgelên etnîk yên han kom bû ku, endamên wan di nava dewletekêdepiranî, di nava yê dinê (bi piranî dewletên cîran) de hindikahî bûn û bona vê yekê, bala hukumetên herdu dewletan jî dikişandin ser xwe û ger nebin sedemê şer û pevçûnan jî, di navbera wan de dijayetîyek peyda dikirin. Bi rastî jî, pirî caran dijayetîyên hanê şikil dane dîroka Ewrûpê.

Helwesta KBHN li himber dijayetîyên hûrgelên netewî, helwesteke serbixwe, bêteref û hevkar e. Ji ber ku KBHN ne dezgeyeke teftîşî ye, ew gor pîvanên (standardên) navnetewî kar dike ku her dewletekî bî çarçuveya wê û şîretên wê re razî bûye. Bi vê wesîlê, gelek mihîm e ku em bînin bîra xwe, berpirsîyarîyên ku wan dewletên endamê RPHE girtine ser xwe, bi taybetî Dokumentê Kopenhagê ya sala 1990 ya Konferansa li ser Dîmena Mirovî, Beşa IV, ku berpirsîyarîyên wan di heqê hûrgelên netewî de yek bi yek bi nav dike. Dîsa, tiştê gelek mihîm e ku divê neyê jî bîrkin, hemû dewletên endamê RPHE bi berpirsîyarîyên Milletên Yekbûyî jî girêdayî ne di heqê mafên mirovî de, ku mafên hûrgelan jî di nav de ye; dîsa piranîya dewletên endamê RPHE tabîyê pîvanên Konseya Ewrûpê ne.

KBHN, piştî xebateke baş ya pênc salan, li gelek welatan ku lê mijûlbû, karibû hin pirs û nakokîyan nas bike ku bala wê kişandibûn û xwe dubare dikirin. Mafên zimanî yên hûrgelên netewî, ango mafê wan kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, karanîna zimanê xwe di warê pêwendîyên şexsî (prîvat) û civakî de, pirseke hanê ye. Sazîyên mafên mirovî yên navnetewî, bi gelek wesîleyan behsa vî mafî dikin. Bi alîyekê, ziman tiştê şexsî ye ku bi nasnama mirovan re girêdayî ye. Li alîyê dinê, ziman haletê hanê ye ku rêxistina civakî bê wê nabe û di gelek waran de mafê giştî têdeheye. Şik tune ku, karên dewletê bi gelek alîyan de bi karanîna ziman çêdibe. Li dewleteke demokratîk ku hurmeta mafên mirovî dike, hemahengîya pirrengîya heyî, bi vî awayî dibe esasekî mihîm ji bo sîyaset û hiqûqê. Dema di vî warî de balanseke minasiw nebe, hingê rê vedibe ji bo dijayetîyên etnîkî.

Ji ber vê yekê, KBHN, di havîna 1996 de daxwaz kir ku Wakfa Pêwendîyên Nav- Etnîkî bi komeke piçûk yên pisporan re bişêwre ku di warê navnetewî de naskirî ne û guh bide pêşniyarên wan ji bo mafên zimanî yên wan kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, û lê binêre ew maf di welatên RPHE de bi şiklekî minasiw bi cî bîn. Berî vê jî, daxwazeke usa ya KBHN hatibû cî û bi aliyê Pêşniyarên Laheyê di Heqê Mafên Perwerdeyî yên Hûrgelên Netewî û Nîşeyên Agahdarîyê de hûr hûr heatibûn kolandin. Lê belê, Pêşniyarên Laheyê ku li ser karanîna ziman yan jê zimanên hûrgelên netewî di warê perwerdeyî de bûn, ev babet li der lêkolînên pisporan hiştibûn.

Wakfa Pêwendîyên Nav-Etnîkî -ku rêxistineke sîwîl e û di 1993 de avabûye ji bo alîkarîya KBHN bike di hin karên taybetî de- kesên pispor li ser babetên cuda cuda civandin û raya wan girt, ku ji van civînan du heb li Oslo, yek jî li Laheyê çêbûn. Yek ji wan civîna hiqûqnasan bû li ser hiqûqa navnetewî, yên dinê civîna zimanzanan, ya parêzger û lêkolînerên sîyasî, ku pispor bûn di heqê rewş û hewcedarîyên hûrgelan de. Pisporên ku di van civînan de beşdar bûn ev in:

Professor Gudmunder Alfredson, Midûrê Înstîtûya Raoul Wallenberg (Swêd); Pdoessor Asbjørn Eide, Doktorê bi Qidem, Înstîtûya Mafên Mirovî ya Norwecê (Norwec); Ms. Engelita Kamenska, Lêgerînerê Sereke, Navenda Mafên Mirovî û Îlmên Etnîkî (Latvîya); Mr. Dónal Ó Riagáin, Sekriterê Giştî, Daîra Zimanên ku Kêm bi Kartên (Îrlandiya); Ms. Beate Slydal, Şêwirdar, Foruma Norwecê ji bo Azadîya Bîr û bawerî (Norwec); Dr. Miquel Strubell, Midûr, Înstîtûya Katalanan ya Sosyolinguîstîks, Hukumeta Katalonya (Spanya); Professor György Szepe, Beşa Îlmên Zimanan, Zankoya Janus Pannonius (Hungarî); Professor Patrîck Thornberry, Beşa Hiqûqê, Zankoya Keele (Qeyzerîya Yekgirtû); Dr. Fernand de Varenes, Midûrê Navenda Asya-Pasîfik ya Mafên Mirovî û Pêşlêgirtina Pevçûnên Etnîk (Australya); Professor Bruno de Witte, Beşa Hiqûqê, Zankoya Maastrichtê (Holande); Mr. Jean Marie Voehrling, Înstîtûya de droit local alsacien-mosellan (Franse).

Qasî ku pîvanên mafên hûrgelan yên heyî beşekî mafên mirovî ne, di van civînan şêwrê de pisporan berî her tiştî bala xwe dane ser pîrsa hanê, gelo, dewlet çiqas berpirsîyarîya xwe bi cî bînin di warê mafên mirovî de bi awayekî giştî, bi taybetî jî, wekhevî û azadîya ji neheqî û cudakarî, azadîya bîr û bawerî, azadîya civîn û komelayetî, her usa jî heq û azadîyên wan kesan ku mensûbê hûrgelan in?

Di van civînan de her usa jî hat xuyakirin ku, armanca dawî ya hemû mafên mirovî, pêşvebirina kesayetîya mirov e bi şiklekî fireh û azad li ser esasê wekhevîyê. Di dawîyê de hat pêşniyarkirin ku civaka sîwîl divê vekirî be, bi hereket û guhartin be, ango bikaribe herkesî nêzî hev bike, tevî kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne. Her usa, ku karanîna ziman haletê bingehîn e ji bo dan û stendîne, ango dîmena civakî ya bingehîn ya tecrubeya mirovan jî hat xuyakirin.

Li dawî Pêşniyarên Oslo di heqê Mafên Zimanî yên Hûrgelên Netewî de, hewl dide naveroka mafên zimanî ya hûrgelan zelal bike, bi şiklekî giştî, ew çawa bi kar bîn di çarçuveya ku KBHN pê mijûl dibe. Tevî wê jî, pîvan (standard) usa bîn şirovekirin ku, ewê bikaribin di jîyanê de bi hemahengî bi kar bîn. Pîşniyar di bin sernivîsên hûrik de dabeş dibin, ku her yek ji wan bi pirseke li ser ziman re radibe, ku di pratîkêdederdikeve pêş. Di heqa van pêşniyaran de îzahateke berfireh di “Nîşeya Agahdarîyê” ya dinê de heye, ku li piştî pêşniyaran cî digre û tê de pîvanên navnetewî di heqê vê pîrsê de jî hatine nîşandan. Ji vê yekê armanc ev e ku, her pêşniyar bi tevî paragrafa taybetî ya Nîşeya Agahdarîyê re bê xwendin, ku wê eleqeder dike.

Hêvî ji vê xebatê ev e ku, ev şîret û pêşnîyar bibin çavkanîyeke baş ji bo pêşvebirina sîyaset û hiqûqa dewletan di warê bî cîanîna mafên zimanî yê wan kesan ku mensûbê hûrgelên netewî ne, bi taybetî di warê civakî de.

Herçiqas ev Pêşnîyar li ser karanîna ziman in bi aliyê kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, lê ew her usa jî dikarin ji bo hûrgelên cuda jî bi kar bên. Armanca van Pêşnîyarên ku li jêrê hatine rêzkirin zelalkirin û xurtkirina mafan e. Armanca wan tucar ne tengkirina mafên mirovî ya kesan û grûban e.

PÊŞNÎYARÊN OSLO DÎ HEQÊ MAFÊN ZIMANÎ YÊN HÛRGELÊN NETEWÎ DE

NAV

1) Kesên ku mensûbê hûrgelên Netewî ne, xwedî maf in ku navên xwe yên şexsî bi zimanê xwe kar binin gor adetên xwe û sîstema zimanê xwe. Divê ev heq bi şiklekî fermî bê qebûlkirin û daîreyên resmî jî gor wê bikin.

2) wek vê, sazîyên nefermî wek komeleyên çandî û şîrketên kar ku bi destê mensûbên hûrgelên netewî hatine avakirin, dikarin ji vî heqê îstîfade bikin ji bo karanîna navê xwe.

3) Li herêmên ku mensûbên hûrgelên netewî bi giranî lê dijîn û kîngê ji aliyê wan daxwazeke ku têrê dike hebe, divê miqamên resmî tevdiran bistînin ji bo nîşandana navên herêmî, yên kûçe û kolanan û nîşanên dinê yên topografîk bi zimanê hûrgelê.

DÎN

4) Herkesek di karê dînê xwe û di îbadeta xwe de, bi serê xwe yan jî tevî kesên dinê bi şiklekî cemaîrî, divê bikaribe zimanê xwe bi kar bîne.

5) Ji bo seremonî û emelên dînî ku her usa jî rewşa medenî eleqeder dikin û tesîrê li ser jîyana yasayî dikin, dewlet dikare daxwaz bike ku wesîqe û dokumentên hanê bi zimanê, yan jî bi zimanên resmî yên dewletê jî bêne çêkirin. Dewlet dikare daxwaz bike ku qeydên ku rewşa medenî eleqeder dikin her usa jî bi zimanê yan jî bi zimanên fermî bêne parastin bi destê miqamên dînî.

JÎYANA CEMAÎRÎ û RÊXÎSTÎNÊN MEDENÎ (NGOs)

6) Hemû kes, mensûbên hûrgelên netewî jî di nav de, xwedî maf in ku rêxistin, komele û înstîtûyên medenî ava bikin û karê wan bi rêve bibin. Ev sazî kîjan zimanî, yan jî zimanan bixwazin divê bikaribin bi kar binin. Dewlet, ji ber zimanê wan divê dijî wan sazîyan cudakarî neke û mafê wan teng neke di warê alîkarîgirtinê de ji butçeya dewletê, ji çavkanîyên navnetewî û ji sektora şexsî

7) Ger dewlet bi xurtî, tevî tiştên dinê, alîkarîya kar û xebatên civakî, çandî û werzîşî dike, divê li ser esasê edaletê parekê jî veqetîne ji bo wan kar û xebatên bi vî cureyî ku bi aliyê mensûbên hûrgelên netewî tene kirin. Alîkarîya dewletê ya diravî ji bo kar û xebatên ku di zimanê wan kesên mensûbê hûrgelên netewî de û di van waran de pêk tên, divê bi şiklekî necudakar bêne garantîkirin.

MEDYA

8) Kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, xwedî maf in ku medyaya bi zimanê xwe yê hûrgelî ava bikin û rêve bibin. Nîzama dewletê ji bo medyayê divê li ser esasekî makûl û necudakar be û mafên hûrgelan teng neke.

9) Ew kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, divê ji bo weşana bi zimanê wan jî waxt bê amadekirin di medyaya han de ku bi destê dewletê finanse dibe. Dirêjî û qalîteya zeman ku ji bo weşana bi zimanê hûrgel tê veqetandin di dereca netewî, herêmî û mehelî de, divê gor hejmar û giraniya nifûsa hûrgela netewî û rewş û hewcedariya wê be.

10) Çi di medyaya dewletê çi di ya şexsî de, serbestiya amadekirina bernameyên bi ziman yan jî zimanên hûrgelan divê bêne parastin. Buroyên medya dewletê ku bernameyên wê bi aliyê naverok û kar bi rêve dibin, divê serbixwe bin, di wan buroyan de mensûbên hûrgelên netewî jî kar bikin.

11) Weşana medyaya ku ji der welat tê kirin, divê neyê astengkirin. Hebûna medyayeke han nabe sebep ku zimanê weşanê yê ku di medyaya dewletê de ji bo hûrgelê hatîye veqetandin bê tengkirin.

JÎYANA ABORÎ

12) Hemû kes, kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne jî di nav de, xudan maf in ku di warê aborî de sazîyên şexsî ava bikin û rêve bibin bi ziman -yan jî zimanên- ku ew bixwazin. Dewlet dikare tevî vê, karanîna ziman –yan jî zimanên- fermî yê dewletê jî bixwaze, kîngê mafê giştî yê qanûnî hewce bike, wekî parastina mafên karkeran, yan miştêriyan, yan jî dan û stendinên di navbera şîrket û dewletê de.

MÎQAMÊN ÎDARÎ Û XİZMETÊN CIVAKÎ

13) Li herêm û mehelên ku mensûbên hûrgelên netewî bi hejmareke mihîm hebin û dema daxwaz bikin, mafê wan heye ku dokument û belgeyên sazîyên resmî yên wan herêman û mehelan him bi zimanê -yan jî zimanên- resmî, him jî bi zimanê hûrgelê bin. Her usa jî, divê sazîyên herêmî yan jî mehelî divê qeydên hanê bi zimanê hûrgelê jî çêbikin.

14) Mensûbên hûrgelên netewî, divê xudan firsend bin, bikaribin bi miqamên îdarî re bi zimanê xwe bidin û bistînin, bi taybetî bi miqamên herêmî û mehelî re, ku li wir xudan hejmareke baş bin û vê daxwazê nîşan bidin. Her usa, miqamên îdarî jî divê, li kîderê firsend hebe, xizmetên xwe bi zimanê hûrgela netewî jî bi kar bînin. Bona vê yekê divê bernameyên perwerdeyî pêk bînin, xwe ji bo vî karî hazir bikin.

15) Li herêm û mehelên ku mensûbên hûrgelên netewî têra xwe heye, divê dewlet tevdiran bistîne da ku kesên tene hîlbijartin ji bo sazîyên îdarî li van herêm û mehelan, bikaribin zimanê hûrgelên netewî jî bi kar bînin di dema xizmetên van sazîyan de.

SAZÎYÊN NETEWÎ YÊN SERBIXWE

16) Dewletên ku li wir mensûbên hûrgelên netewî dijîn, divê îmkanê bidin wan ku, dema ew kes gihan wê qeneetê ku mafên wan ên zimanî zirar dîtîye, bikaribin, tevî miqamên hiqûqî yên minasiw, serî li sazîyên netewî yên serbixwe xin, wek kesên ombûdsman yan komîsyonên mafên mirovî.

MIQAMÊN HIQÛQÎ

17) Tevî ew kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, heqê hemû kesan heye ku dema hatine girtin, yan binçav bûn, yan jî bi şiklekî din bi curmekî hatin gunekarkirin, divê di zûtirîn dem de, sebebê vê yekê ji wan re bê eşkerekirin bi zimanê ku ew jê fêmdikin û dikarin bi vî zimanî û ger hewce be bi alîkarîya tercumanekî û bi şiklekî bê pere, berî mehkemê, dema mehkemê û di dereca temyîzê de xwe biparêzin.

18) Li herêm û mehelên ku mensûbên hûrgelên netewî bi hejmarekî têr lê dijîn û ger daxwaz hebe, heqê mensûbên van hûrgelan heye ku di dema pêvajoya hiqûqî de ji bo eşkerekirina merema xwe zimanê xwe bi kar bînin û ger hewce be bi alîkarîya tercumanekî.

19) Li herêm û mehelên ku mensûbên hûrgelên netewî bi hejmarekî têr lê dijîn û ger daxwaz hebe, divê dewlet li ser vê yekê baş bisekine û rê û îmkanan peyda bike, da ku pêvajoya hiqûqî ku tesîra xwe li ser kesên hanê dike, bi temamî bi zimanê hûrgelê pêk bê.

MEHRÛMBÛN JÎ AZADÎYÊ

20) Midûr û personelê din yê sazîyeke cezayî (girtîgeh, hepisxane), divê bikaribin ziman –yan jî zimanên- pîranîya girtî û mehkûman, yan jî zimanekî ku pîranîya wan jê fêm dike, qise bikin. Bona vê yekê divê ji bo personel qurs, yan jî bernameyên perwerdeyî bi cî bînin. Kîngê hewce be, divê tercumanek bê karanîn.

21) Kesên girtî ku mensûbê hûrgela netewî ne, heqê wan heye ku di dan û stendinê de, çî bi yê hundur re, çî bi kesên dinê re, kîjan zimanî dixwazin wê bi kar bînin. Miqamên resmî jî divê, çiqas îmkân hebe, tevdiran bistînin ku girtî û mehkûm bikaribin zimanê xwe him di warê axaftinê de, him jî di nameyên şexsî de bi kar bînin, gor sînoren ku bi qanûnê hatine danîn. Her usa jî, kesên girtî yan jî mehkûm, çiqas îmkân hebe, divê di girtîgeh yan jî hepisxaneyêke nêzî cîyê rûniştgeha wan bêne cîkirin.

NÎŞEYÊ AGAHDARÎYÊ

JÎ BO

PÊŞNÎYARÊN OSLO DÎ HEQÊ MAFÊN ZIMANÎ YÊN HÛRGELÊN NETEWÎ DE

PÊŞGOTÎN

Benda 1ê ya Daxuyanîya Cîhanî ya Mafên Mirovî dibêje ku hemû mirov bi xwedî şeref û rûmet tene dinyayê, ku bingeha esasî ye ji bo hemû mafên mirovî. Benda 1 ya Daxuyanîyê usa dibêje: „Hemû mirov azad tene dinyayê û di şeref û heqên xwe de wekhev in...“ Girîngîya vê bendê divê ji bîran neçe. Ev, ne ku tenê bi awayekî giştî behsa mafên mirovî dike, lê her usa jî bingehê e ji bo mafên zimanî yê wan kesan ku mensûbê hûrgelên netewî ne. Ji ber ku mirov di şeref û mafan de wekhev in, divê ji nasname hemû kesan re hurmet bê nîşandan. Ziman beşeke bingehîn e ji nasnameya mirovan. Bona vê yekê, ji heysîyet û şerefa mirovan re hurmet, her usa jî, ji nasnameya wan û ji zimanê wan re hurmetê şert dibîne.

Di vê behsê de, Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî de gelek mihîm e. Benda 2 ya Peymanê ji Dewletan dixwaze ku ew çî lazîm e bikin, da ku mafên mirovî ji bo hemû kesên ku li ser erda wan dijîn û tabîyê hiqûqa wan in bi cî bîn û bi wan re hurmet bê nîşandan, „di tu warî de ferqî û cudakarî nebe, her usa di warê...zîman de...“ Benda 19 ya Peymanê azadîya eşkerekirina bîr û bawerî garantî dike. Ev bend ne ku tenê heqê eşkerekirina bîr û bawerî û girtina malûmat û bîr û baweriyên her cureyî –çî ji hundur çî ji dervayî welatdide mirovan, her usa jî di warê medya û zîman de jî vî heqî garantî dike, gor daxwaza kesan. Ji bo dan û stendina înforsasyonê jî gelek caran divê xelk bê ba hev. Di vê çarçûvê de, Benda 21 û 22 ya Peymanê mafê azadîya çêkirina civîn û sazîyan garantî dikin.

Wekî vê, li Ewrûpa, azadîya eşkerekirina bîr û bawerî di Benda 10an ya Peymana Ewrûpa ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn de hatîye garantîkirin, tevî Benda 14 ya vê Peymanê, ku dibêje, „divê di tu warî de...di zîman de... tu cudakarî nebe.“ Tevî van herdu çavkanîyan, ango Daxuyanîya Cîhanî ya Mafên Mirovî û Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn, Daxuyanîya Konseya Ewrûpê li ser Azadîya Bîr û Ray û Înforsasyonê de dide xuyakirin ku „Azadîya bîr û bawerî û înforsasyonê şertekî mihîm e ji bo pêşveçûna herkesekî di warê civakî, aborî, çandî û sîyasî de, her usa jî ji bo pêşveçûneke hemahengî ya grûbên civakî, çandî, netewî û civakên navnetewî“. Di vê babetê de, azadîyên ji bo civînên aşîtxwazane û komelayetî di Benda 11 ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn de hatine garantîkirin, ku ev jî mihîm e.

Di çarçûveya Rêxistina ji bo Parastin û Hevkarîya Ewrûpê (RPHE) de, ev fikrên bingehîn li ser azadîyên eşkerekirina bîr û bawerî, civîn û komelayetî di paragrafên 9.1-9.3 yê Dokumentê Civîna Kopenhagê ya Konferansa li ser Dîmenên Mirovî de hatine rêzkirin.

Di Senedê Parîsê ji bo Ewrûpayeke Nû de, Serokê Dewlet û Hukumetan yê dewletên endam yê RPHE, „beyan dikin ku ...azadîya eşkerekirina bîr û bawerî, azadîya komelayetî û civînên aşîtxwazane... bê cudakarî, heqê hemû kesan e.“

Benda 27 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî şertekî mihîm yê din e ku rasterast li ser mafên zîmanî yê hûrgelên netewî ye. Di vî bendî de tê gotin ku: „Ew kesên ku mensûbê... hûrgelekê ne, divê, tevî kesên dinê yê grûbê xwe, ji mafên xwe bêpar nemînin û bikaribin... zîmanê xwe bi kar bînin.“

Wekî vê, Benda 2 (1) ya Daxuyanîya Millêten Yekbûyî li ser Mafên wan Kesan ku Mensûbê Hûrgelên Netewî yan jî Etnîk, Dînî û Zîmanî ne, dibêje, ew kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, heqê wan e „karanîna zîmanê xwe, di warê şexsî (prîvat) û civakî de, bi azadî û bê midaxale û bê cudakarî.“ Benda 10 (1) ya Peymana Çarçûve ya Konseya Ewrûpê ji bo Parastina Hûrgelên Netewî dibêje, divê Dewlet mafê wan kesan nasbike ku mensûbê hûrgelên netewî ne û divê ew „bikaribin zîmanê xwe yê hûrgelî di warê pêwendîyên şexsî û civakî de, di warê axaftin û nivîsandinê de bi serbestî û bê midaxale bi kar bînin.“

Herçiqas di belgeyên sazîyên hanê de behsa karanîna zîmanê hûrgelan di warê şexsî û civakî de têne kirin, van sazîyan warên „civakî“ ji warên „şexsî“ sedî sed cuda nekirine. Bi rastî jî ewana dikarin tevîhev bin. Ev tişt dikare bibe, wek nimûne, kîngê şexsan wek ferdekî yan jî tevî kêsên dinê, ango wek cemahîr, hewl dan ku medya yan jî mektebên xwe yê taybetî (prîvat) ava bikin. Ev karê hanê dikare wek însîyatîfêke şexsî dest pê bike û piştre bibe babetê eleqederîyeke qanûnî yê civakî. Eleqeyeke hanê dikare rê bide ji bo nîzameke civakî.

Dema behsa karanîna zimanên hûrgelan di warên „civakî û şexsî de“ bi destê wan kesan ku mensûbê hûrgelan in dibe, helbet karê perwerdeyî ne li dervayî vê kar û mijûlîyê ye. Li ser babetên perwerdeyî , qasî ku zimanên hûrgelan eleqeder dikin, di Pêşniyarên Laheyê di Heqê Mafên Perwerdeyî yên Hûrgelên Netewî de hûr hûr hatîye sekinîn. Ew Pêşniyar ji bo maf û daxwaza Komîsyona Bilind ya Hûrgelên Netewî ya RPHE û bi destê Wakfa Pêwendîyên Nav-Eknîkî û bi rîya şewrê hatine hazirkirin, bi tevî pisporên ku him di warê mafên mirovî yên navnetewî, him jî di warê perwerdegarîyê de hatine naskirin. Pêşniyarên Laheyê hatine kemilandin û pêşvebirin, da ku dîtînen sazîyên navnetewî di warê mafên mensûbên hûrgelên netewî de zelal be, ku ev yek, ji bo pêşvebirina kesayetîya (nasnameya) mensûbên hûrgelên netewî gelek mihîm e.

Sazîyên mafên mirovî yên navnetewî, wek şertekî mihîm dibînin û dibêjin ku, mafên mirovî cîhanî ne, ango bo herkesî ne û divê bê cudakarî bi kar bînin û herkesek li ser esasê wekhevîyê ji wan feyde bistîne. Piraînya mafên mirovî helbet ne mitlaq in. Dezgeyên di vî warî de hin hal û rewşên taybetî nîşan dane, ku heqê dewletan heye ji van mafan re sînoran daynin. Hiqûqa navnetewî ya mafên mirovî ji van sînokirinan re mecal daye, wek ji bo parastina jîyana mirovan ji bûyerên xeternak, yan hal û mercên ku ji bo maf û azadîyên kesên dinê xeter bin, yan jî hal û mercên ku ehlaqa civakî (umûmî), sihheta civakî, aramîya netewî û refaha giştî di civaka demokratîk de bikin xeterê. Lê divê di yasayên mafên mirovî de ev qeyd û şertên azadîyan bi şiklekî teng bêne şirovekirin.

Ew kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, mafê wan ê karanîna zimanê –yan jî zimanên- xwe di warên şexsî û civakî de, ku di çarçuveya Pêşniyarên Osloyê di Heqê Mafên Zimanî yên Hûrgelên Netewî de hûr hûr hatîye rêzkirin, lê beşdarîya civaka fireh jî baskê dinê ye û divê tim li ber çavan be. Armanca van Pêşniyaran ne îzolekirin e, ew bi alîyekê ve mafên mensûbên hûrgelên netewî teşwîq dikin, nasname, çand û zimanê wan diparêzin û pêşve dibin, bi alîyê din jî rê vedikin ku ew li ser esasê wekhevîyê bibin endamê civaka fireh, ango di navbera herdu alîyan de balanseke çêbe. Bona vê yekê, dema di warê ziman –yan jî zimanên- dewletê yên fermî de zanîneke baş nebe, ev nêzîkbûn çênabe. Daxwaza ji bo perwerdeya hanê di Bendên 13 û 14 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Aborî, Civakî û Çandî de û di Bendên 28 û 29 ya Peymana li ser Mafên Zarokan de -ku mafê perwerdeyî hewce dibîne û ji dewletê diwaze ku xwendina îcbarî bi cî bîne- heye. Her usa jî, Benda 14 (3) ya Peymana Çarçuve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî şert dibîne ku, xwendina bi zimanê hûrgelê „bê hukmê pêşîn, divê bê temamkirin bi hînbûna zimanê resmî yê dewletê, yan jî bi xwendina bi vî zimanî.“

NAV

1) Benda 11(1) ya Peymana Çarçuve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî şert dibîne, ku heqê mensûbên Hûrgelên netewî ye, dikarin navê xwe yê pêşîn, navê malbatê û paşnavê xwe bi zimanê xwe bi kar bînin. Ev maf, ku bi cîhanî wê gelek mihîm e ji bo nasnameya wan ê kesayetî, divê gor şert û mercên taybetî yê her dewletê de bi kar bê. Wek nimûne, Miqamên resmî dema elîfbeya ziman -yan jî zimanên- resmî bi kar bînin ji bo nivîsandina navên wan kesan ku mensûbê hûrgelên netewî ne, divê xwedî sedemên makûl bin, ango ev nivîsandin gor fonetîka, ango dengên zimanê hûrgelê bin. Lê divê ev yek gor sîstema ziman û adetên hûrgela netewî bi cî bê. Ango ev heqekî gelek bingeîn e û him bi zimanê kesan him jî bi nasnama wan re bi xurtî girêdayî ye. Kesên ku bi destê miqamên resmî mecbûr mane ku navên xwe yên eslî yan jî malbatî (yên dê û bavên) berdin, yan jî, ku navê wan bê rizaya wan hatibe guhartin, heqê wan e ku ew nav li wan bînin vegerandin, bê mesref û bedêlekê.

2) Nav ji bo nasnameya miştêrek jî gelek mihîm in, bi taybetî ji bo wan kesên ku mensûbê hûrgeleke netewî ne û bi hevra „wek cemahîr“ hereket dikin. Benda 2(1) ya Daxuyanîya MY li ser Mafên wan Kesên ku Mensûbên Hûrgelên Netewî yan jî Etnîk, Dînî û Zimanî ne, dibêje ew kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, heqê wan heye „zimanê xwe di warê şexsî û civakî de bi serbestî kar bînin, bê midaxale û bê tu cureyê cudakarî. Benda 10(1) ya Peymana Çûrçuve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî şert dibîne ku Dewlet mafên mensûbên hûrgelên netewî nas bike ji bo ku ew „zimanê xwe yê hûrgelî di warê şexsî û civakî de, bi devkî û nivîskî û bi serbestî û bê midaxale bi kar bînin. Benda 27 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî beyan dike û dibêje: „kesên ku mensûbê... hûrgelan in divê ji heqê axaftina zimanê xwe... bi endamên dinê yên grûbê xwe re bêpar nemînin.“ Çawa mafê kesan heye ku zimanê xwe di warên civakî de tevî kesên dinê, ango bi şiklekî cemahîrî û bê midaxele û bê cudakarî bi kar bîne, yek ji nîşana vê ya xurt ev e ku, sazî, komele û rêxistinên yasayî (legal) û şirketên kar, ku bi destê mensûbên hûrgelên netewî hatine avakirin û têne îdarekirin, dikarin gor daxwaza xwe, navekî ji zimanê hûrgelê bi kar bînin. Navê han ê miştêrek divê bi aliyê miqamên resmî bêne naskirin û gor adet û sîstema zimanê wê grûbê (cemahîrê) bi kar bê.

3) Benda 11(3) ya Peymana Çarçuve dibêje ku, „li herêmên ku hûrgelên netewî, wek adet-usûl (ji berê de) û bi hejmareke têrî xwe lê dijîn, divê hemû teref bi vî şiklî bikin... Nîşanên navên adetî yên herêmî, navên kolan û kûçeyan, û nîşanên dinê yên topografîk ji bo umûm, her usa jî divê bi zimanê hûrgelê be, ger di vî warî de têr daxwaz hebe. Qebûlnekirin û nasnekirina navên dîrokî yên bi vî şiklî, wek hewldaneke ji bo guhartina dîrokê û helandina (assîmîlekirina) hûrgelan e ku xetereke ciddî ye ji bo nasname wan kesên ku mensûbê hûrgelan in.

DÎN

4) Benda 27 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî dibêje: „Li wan dewletên ku hûrgelên etnîk, dînî û zimanî hene, kesên ku mensûbê wan hûrgelan in, tevî kesên dinê ku mensûbê wê grûbê ne... divê ji mafên eşkerekirin û îbadeta dînê xwe bêpar nebin û bikaribin zimanê xwe bi kar bînin.“ Benda 3(1) ya Daxuyanîya MY li ser Mafên Kesan ku Mensûbê Hûrgelên Netewî yan jî Etnîk, Dînî û Zimanî ne, şert dibîne û dibêje: „Kesên ku mensûbê hûrgelan in, dikarin heqên xwe... bi şiklekî ferdî, her usa jî, tevî kesên dinê yên grûba xwe bi şiklekî cemahîrî, bê cudakarî bi kar bînin.“

Bawerîya dînî û îbadeta wê „bi şiklekî cemahîrî“ gelek mihîm e ji bo gelek kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne. Bi vê wesîlê divê bê gotin ku, serbestîya dînî ji bo herkesekî hatîye garantîkirin di Benda 18(1) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 9(1) ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn. Tevî vê jî, azadîya eşkerekirina dînê xwe û bawerîyên xwe, îbadeta umûmî jî di nav de, di gelek alîyan de hatîye sînorkirin ku di binê van bendan de yek bi yek hatine rêzkirin. Ev sînoren hanê divê bi qanûnê bêne nîşandan û ji bo parastina emnîyeta giştî, nîzam, sihhet, ehlaq û ji bo parastina heq û azadîyên bingehîn yên kesên dinê bin. Divê ev sînor makul bin û gor armancê bin, û divê dewlet wan, ji bo pêpeskirina heq û azadîyên manevî, zimanî û çandî yên hûrgelan wek mane bi kar neyne.

Ji bo hûrgelan îbadeta dînî, pîrî caran, bi taybetî, bi parastina nasname çandî û zimanî ve girêdayî ye. Heqê karanîna zimanê hûrgelê di îbadeta umûmî de tiştêkî tebîyî ye, wek heqê avakirina sazîyên dînî, heya bi çanîna îbadeta umûmî bi xwe. Bona vê yekê, divê miqamên resmî çî li pêş îbadeta giştî (umûmî) çî jî bi zimanê ku di îbadeta giştî de bi kar bê -ew dikare

zimanê hûrgelê be, dikare zimaneke ayînî be ku bi alîyê cemahîrê bi kar bê- tu astengên bê mane jê re dernexe.

5) Kiryarên dînî wek merasîmên zewacê, yên binaxkirinê (di halê mirinê de) jî kiryarên legal û medenî ne û divê wek mafên medenî bêne qebûl kirin li welatên hanê. Di rewşên hanê de divê mafê giştî (umûmî) li ber çavan bê girtin. Karên îdarî divê mafên mirovî paymal nekin û miqamên resmî tu astengên zimanî li ser cemahîrên dînî ferz nekin. Ev yek divê, di warê karên îdarî yên cemahîrên dînî de jî li ber çavan bê girtin, ku hin caran bi hiqûqa medenî re têkilî hev dibe. Ango, dewlet dikare ji cemahîrên dînî bixwaze ku ew kiryarên xwe yên medenî bi ziman –yan jî zimanên- dewletê yên resmî jî qeyd û tescîl bikin, da ku Dewlet jî bikaribe kar û teftîşa xwe ya îdarî bike.

JÎYANA CEMAHÎRÎ Û RÊXÎSTÎNÊN MEDENÎ (NGOs)

6) Jîyana miştêrek ya kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, kiryarên wan „wek cemahîrî“, çawa sazîyên navnetewî dibêjin, xwe di gelek kar û xebatan de û di warê mijûliyan de xuya dikin. Ji vana, yên ku bi rîya rêxistinên medenî, komeleyan û sazîyên dinê pêk tên ne hindik in. Hebûna van sazî û rêxistinan ji bo parastin û pêşvebirina nasnameya wan gelek mihîm e û her usa jî hatîye tecrubekirin ku, tesîreke baş dike li ser pêşvebirina civaka medenî û qîmet û hêjayîyên demokrasîyê.

Benda 21 û 22 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 11 ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn heqê kesan garantî dikin di warê civînên aşitîxwaz û azadîya rêxistinî de. Heqê kesan ji bo kar û xebat bi şiklekî „cemahîrî“ tevî endamên grûb yên dinê –heqê wan ji bo avakirin û îdarekirina rêxistin, komale û sazîyên wan ên medenî- yek ji nîşana civakeke vekirî û demokratîk e. Dîsa Benda 27 ya vê Peymanê dibêje: „Kesên ku mensûbê... hûrgelan in, tevî kesên dinê ku endamê grûb in, bi şiklekî cemahîrî, divê ji heqê... karanîna zimanê xwe bêpar nemînin.“ Ango wek qeyde, divê miqamên resmî têkilî karê hundur yên van sazîyên ku „bi cemahîrî xebat dikin“ nebin, ne jî divê qeyd û şertan ji bo wan daynin, ji wan qeyd û şertan pêve, ku bi alîyê hiqûqa navnetewî hatine danîn. Wekî vê, Benda 17(2) ya Peymana Çarçûve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî jî, ji Dewletan dixwaze ku ew „têkilî mafên mensûbên hûrgelên netewî nebin, di warê beşdarîya kar û xebatên rêxistinên medenî de, çi di warê netewî çi di warê navnetewî de.“

Benda 2(1) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî wek şertekî dibîne û dibêje, her Dewlet berpirsiyar e û divê tevdîran bistîne da ku „ew hemû kesên ku li ser erdê wê dewletê dijîn û tabîyê hiqûqa wê ne, dikarin ji hemû mafên ku di vê peymanê de hatine naskirin îstîfade bikin, li ser esasê wekhevîyê û bê ferqî, her usa jî di warê ziman de.“ Gor vê esasê, divê Dewlet di warê ziman de tu ferqî daneyne navbera rêxistinên medenî (NGO’yan) û tu daxwazên bê mane neke ji wan. Digel vê yekê, miqamên resmî dikarin ji rêxistin, komele û sazîyên hanê bixwazin ku ew gor daxwazên hiqûqa hundur ya li ser bingehê mafên rewa yên umûmî- bikin, karanîna zimanê –yan jî zimanên- resmî yê Dewletê jî di nav de.

Bi alîyê çavkanîyên aborî, paragrafa 32.2 ya Dokumentê Kopenhagê dibêje, kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne, heqê wan heye ku „sazî, rêxistin û komeleyên xwe yên perwerdeyî, çandî û dînî ava bikin û bi rêve bibin, bikaribin ji bo wan li çavkanîyên aborî yên bidil bigerin, pêwendîyên dinê daynin, her usa jî alîkarîya dewletê bixwazin, gor hiqûqa netewî.“ Tevî vê, divê Dewlet rê li ber van sazîyan negre, anga ew bikaribin alîkarîya diravî bixwazin ji butça dewletê, û ji çavkanîyên navnetewî, her usa jî ji sektora şexsî.

7) Di nav wan çalakîyên medenî ku mesrefê wan li ser dewletê ye, yên civakî, çandî û werzîşî hene. Ji bo ku di warê alîkarîyê de esasên wekhevîyê û bêcudakarîyê pêk bên, divê miqamên resmî fondeke minasiw daynin ji bo çalakîyên bi vî cureyî yên di zimanên hûrgelên netewî de ku di nav sînorên wê dewletê de dijîn. Bi vê wesîlê, benda 2(1) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî dibêje, ne ku tenê divê di navbera kesan de li gor zimanê wan tu ferqî nebe, lê her usa jî di benda 2(2) de wek şert datîne û dibêje: Divê dewlet „çi lazim e bikin... ji bo wan mafên ku di vê Peymanê de cî digrin çi guhartinên yasayî hewce ye, divê bi cî binin“. Tevê vê jî, Benda 2(2) ya Peymana Navnetewî li ser Nehiştina Cudakarîya Nijadî (ku hewl dide ji bo nehiştina ferqên her cureyî, lidervahiştin, tengkirina maf û azadîyan, yan jî helwesteke cudakar gor esl, nijad, reng, yan jî gor mensûbîya netewî û etnîkî) wek şertekî nîşan dide û dibêje: „Dewletên teref, kîngê şertên xwe hebin, divê di warê civakî, aborî, çandî û di warên dinê de gavên berbiçav bavêjin ji bo pêşvebirin û parastina grûbên taybetî yên nijadî, yan jî kesên ku mensûbê wan in, bi şiklekî minasiw, da ku bikaribin ji maf û azadîyên bingehîn li ser esasê wekhevîyê û bi şiklekî temam para xwe bistînin...“ ji ber ku ziman pîrî caran, rengê esasî yê etnîsîteyê pêk tîne, ewên ku bi van peymanan tene parastin, cemahîrên zimanê hûrgelan jî divê ji van „gavên taybetî û berbiçav“ feyde bistînin.

Di dereca Ewrûpê de, paragrafa 31 ya Dokumentê Kopenhagê şert datîne û dibêje: „Divê Dewlet li kîderê hewce be li wir gavên taybetî bavêjin, da ku îmkanan bidine mensûbên hûrgelên netewî, ku ew bikaribin, wek welatîyên dinê li ser esasê wekhevîyê ji maf û azadîyên bingehîn îstîfade bikin“. Paragrafa 2 ya Benda 4an ya Peymana Çarçuve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî, Dewletên teref îcbar dike û dibêje: „Li kîderê hewce be, divê çi lazim e bikin, da ku di hemû warên jîyana aborî, civakî û çandî de wekhevîyeke temam û bi netîce pêk binin di navbera mensûbên hûrgelên netewî û piranîyê de“; paragraf 3 ya eynî bendê pê de diçe û dibêje: “Gavên ku gor paragraf 2 hatine avêtin divê wek kiryarên cudakarî neyêne fêmkirin.” Her usa jî, Benda 7(2) ya Senedê Ewrûpê ji bo Zimanên Herêmî û Hûrgelî şert datîne û dibêje: “Armanca avêtina gavên taybetî ji bo zimanên herêmî û hûrgelî pêkanîna wekhevîyê ye di navbera wan kesan ku van zimanan bi kar tînin û hemû civakê de, ango armanc ne pêkanîna cudakarîyê ye dijî wan kesan ku zimanê piranîyê bi kar tînin.” Bi vê wesîlê, miqamên resmî divê bi şiklekî heqnas ji botça dewletê parekê veqetînin ji bo çalakîyên mensûbên hûrgelên netewî, tevî çalakîyên dinê, ji bo yên di warên civakî, çandî û werzîşî de. Alîkarîya han dikare bî rîya pereyên ku dewletê ji bo van karan veqetandîye, bi destê sazîyên civakî bo xêrê û azadhiştin ji beş û salmeyan bibe.

MEDYA

8) Benda 19 ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî, ku heq û azadîya bîr û bawerî, her usa jî eşkerekirina wan garantî dike, nîşaneke gelek bingehîn e ji bo rol û cîyê medyayê di civakeke demokratîk de. Benda 19(1) dibêje: “herkes di bîr û rayên xwe de azad e û jê re têkilî nabe”, Benda 19(2) pê de diçe û azadîya “lêgerîn, dan û stendina malûmat (înfòmasyon) û fikrên her cureyî” garantî dike, “çi li hundur çi li dervayî sînoran, çi bi devkî, çi bi nivîskî yan jî çapkirî, bi şiklê hunerî, yan jî bi rîya medyaya ku ew bixwaze.” Benda 10 ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mrovî û Azadîyên Bingehîn, heq û azadîya ramanî (eşkerekirina bîr û bawerîyan) bi eynî şiklî garantî dike. Dewletên endamê Konseya Ewrûpê vê yekê di Benda 1 ya Daxuyanîya li ser Azadîya Ramanî û Înfòmasyonê de ducar dikin û piştgirîya xwe “ji bo prensîbên azadîya ramanî û înfòmasyonê re, ku bingehê e ji bo civaka demokrat û pirdengî” bi xurtî nîşan didin. Di vê çarçuvê de, Dewlet dîsa di vê Peymanê de eşkere dikin ku, “di warê înfòmasyonê û medyayê de, ew dixwazin medyayeke pîrrengî û pirdengî, serbixwe û xwemuxtar hebe û bîr û rayên cuda cuda bikaribin tê de xwe nîşandin”.

Benda 9 (1) ya Peymana Çarçuve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî bi awayekî zelal dibêje, kesên ku mensûbê hûrgelên netewî ne “di bîr û bawerîyan xwe de seberst in û dikarin fikr û malûmatan bi zimanê hûrgelê bidin û bistînin, bê midaxeleya miqamên resmî, çi ji hundur çi ji der welat...” Ev bendê hanê pê de diçe û dibêje: “divê Dewlet di warê yasayî de çi lazim e bikin, da ku mensûbên hûrgelên netewî di warê medyayê de nebin hedefê tu cudakarîyê.” Benda 9(3) ya Peymana Çarçuve ji bo dewletan şert datîne ku ew “asteng dernexin li pêş mensûbên hûrgelên netewî di warê avakirin û rêvebirina medyaya nivîskî (çapemenî).” Ev bend her usa jî dibêje, “di warê weşana yasayî (legal) bi rîya radyo û têlevîzyonê de, divê dewlet çi lazim e bikin, da ku mensûbên hûrgelên netewî bikaribin di vî warî de jî medyaya xwe ava bikin û kar bînin.” Her usa jî, medya yek ji wan sazîyan e ku di paragrafa 32.2 ya Dokumentê Kopenhagê de ji bo mafên mensûbê hûrgelên netewî wek lazîmîyek hatîye bi navkirin: “Ew dikarin sazî, rêxistin û komeleyên xwe yê perwerdeyî, çandî û dînî ava bikin û bi rêve bibin...” Herçiqas navê medyayê bi şiklekî taybetî li vir ne hatîye gotin jî, medya di parastin û pêşvebirina ziman, çand û nasnamê de xwedî roleke gelek mihîm e.

Herçiqas tiştêkî eyan e û mensûbên hûrgelên netewî xwedî heq in ku dikarin medyaya xwe ya taybetî ava bikin, lê her usa tiştêkî normal e ku di vî warî de di hiqûqa navnetewî de hin qeyd û şert hatine danîn û dewlet jî dikare hin daxwazên makûl bike ji bo îdarekirina medyayê. Benda 9(2) ya Peymana Çarçuve vî tiştî gelek zelal dike, dibêje, azadîya eşkerekirina bîr û rayan (azadîya ramanî) ku di benda 9(1) ya Peymanê de tê behskirin, “terefan ji îzîngirtinê (lîsans) azad nake, gor qeyd û şertên weşana radyo û têlevîzyonê yan jî şîrketên sînemê, li ser esasê bêcudakarî û gor şertên objektîfî.” Ev şert û daxwazên îdarekirinê divê makûl û hewce bin û vî heqî winda nekin.

9) Feyde stendin ji medyaya ku bi destê dewletê fînanse dibe, bi pîrsa azadîya ramanî re bi xurtî girêdayî ye. Benda 9(1) ya Peymana Çarçuve şert datîne û dibêje, azadîya eşkerekirina malûmat û fikran di zimanê hûrgelê de bê têkilîya miqamên resmî, beşek e ji azadîya bîr û ray ji bo mensûbên hûrgelên netewî. Û pê de diçe û dibêje, “divê dijî mensûbên hûrgelên cudakarî nebe di warê medyayê de.” Benda 9(4) ya Peymana Çarçuve şert datîne û dibêje, “divê Dewletên teref çi lazim e bikin da ku mensûbên hûrgelên netewî bikaribin ji medyayê îstîfade bikin.” Ev yek her usa jî heq dide mensûbên hûrgelên netewî, ger ew xwedî hejmareke mihîm bin, divê ji bo wan waxtekî minasiw bê veqetandin ji bo weşana di radyo û têlevîzyona dewletê de; dirêjîya waxta weşanê ji bo hûrgelê divê gor giranîya hejmarê wê be.

Lê dema mirov di heqê middelê weşanê de ji bo hûrgelekê biryarê bide, pir û hindikîya hejmar û giranîya wê hûrgelê li herêma, bi tena xwe têrê nake. Ji bo cemahîrên piçûk, divê mirov bifikire li ser zemanekî minasiw û îmkanan ku têrê bike, ne usa cemahîreke piçûk nikare ji medyayê feyde bistîne.

Tevî vê jî, qalîteya middelê ku ji bo bernamên hûrgelên hatiye veqetandin, pîrseke han e ku divê mirov bi şiklekî makûl û bêcudakarî pê re rabe. Ev beşa zeman ku ji bo bernamêya zimanê hûrgelê hatîye veqetandin divê bi wî şiklî bi kar bê ku mensûbên wê hûrgelê ji wan bernamêyan hez bikin. Bona vê yekê, divê miqamên resmî îmkan bidinê ku ev bernamê di waxtekî baş de bêne weşandin.

10) Di welatekî vekirî û demokratîk de divê miqamên resmî naveroka bernamêyên medyayê sansûr nekin bi şiklekî bê mane. Azadîya eşkerekirina bîr û ray di benda 19(1) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 10(1) ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn de hatîye garantîkirin ku di vî warî de mihîm e. Sînorên ku bi destê miqamên resmî bêne danîn, divê gor Benda 19(3) ya Peymanê be ku şert datîne û

dibêje, ev sînor “tenê dikarin bi alîyê qanûnê bêne danîn û di şertên hanê de: a) Ji bo hurmeta heq û şeref-heysîyetên dinê, b) Ji bo parastina ewleyîya netewî û nîzama civakî yan jî sihhet û ehlaqa civakî.” Benda 10(2) ya Peymana Ewrûpê ji bo parastina mafên Mirovî û Azadiyên Bîngelîn, hema hema eynî sînoran li cî dibîne ji bo têkilîya miqamên resmî di warê azadiya ramanî de.

Divê mekanîzmayeke usa bê danîn ku bernameyên medyaya dewletê yê ku bi destê hûrgelên netewî yan jî bo wan tene hazirkirin, gor dil û daxwaza mensûbên wê cemahîrê bin û di alî wan de wek serbixwe bêne dîtin. Di vê çarçuvê de, beşdarbûna mensûbên hûrgelên netewî (gor hunera wan ê şexsî) di pêvajoya hazirkirina bernameyan de bawerî hasil dike ku serbixweyîya medyayê bê parastin û ewê bikaribe hewcedariyên cemahîrê bi cî bîne.

Gor esasê wekhevî û necudakarîyê, divê sazîyên dewletê bi wî şiklî bin ku, xizmeta çî cure xelkê dikin rengê wê jî bidin. Eva ji bo medyaya resmî jî derbaz dibe. Benda 15 ya Peymana Çarçuve Dewletan berpîrsîyar dike û dibêje, divê ew “çî lazim e bikin, da ku mensûbên hûrgelên netewî bi şiklekî çalak cî bigrin di jîyana çandî, civakî û aborî de û di karên dewletê de, bi taybetî yê ku tesîra xwe li wan dikin.” Benda 2 ya Peymana Navnetewî ya Rêxistina Kar, No. 111 di Heqê Cudakarî di Werê Kar û Mesleg de gelek eşkere ji dewletan dixwaze ku ew “sîyaseteke netewî bi rêve bibin ji bo... wekhevîya firsendan pêk bînin û bi adilî miamele bikin di warê kar û mesleg de, rê nedin tu cureyê cudakarîyê.” Xebitandina mensûbên hûrgelên netewî di medyayê de bi şiklekî necudakarî, temsîlkarî û bêterefîya medyayê nîşan dide.

11) Kîngê em gor ruhê Benda 19(2) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 9(1) ya Peymana Çarçuve ji bo Parastina Mafên Hûrgelan û gor esasên necudakarî lê binêrin, ji bo hûrgelên netewî, bûna xwedî bernameyên xwe bi zimanê xwe di saya weşanên dewleteke dinê yan jî “dewleteke xism û eqrebe” de, nayê wê manê ku, middetê ji bo bernameya bi zimanê wan hatîye veqetandin dikare bê kurtkirin di nava sînorê dewleta ku ew lê dijîn.

Girtin û gihana malûmatan û şebekêyê medyayê ji dervayî welat, beşekî esasî ye ji heqê înfòmasyonê, bi taybetî gor teknîka pêşveçûyî di vî zemanî de. Bona vê yekê, wek nimûne, kîngê mesela lîsansa kablê bê pêşîyê û bi alîyê hûrgela netewî daxwaz bê kirin ji bo van îstasyonan, heqê dewletê tune ku vê daxwazê red bike û lîsansa wan îstasyonên radyo û têlevîzyonê nede ku ji “deqleteke eqrebe” weşanê dikin. Ev heq ne ku tenê ji bo medyaya bi kabl derbaz dibe, her usa jî ji bo şebekeyên elektronîk yê înfòmasyonê di zimanê hûrgelê de jî derbaz dibin.

Wek babeteke giştî, dewletên endam yê Konseya Ewrûpê di Benda III(c) ya Daxuyanîya li ser Azadiya Ramanî û Înfòmasyonê de biryar dan li ser “pêşvebirina hat û çûna înfòmasyonê bi serbestî, bi vî awayî alîkarîya têgihîştina navnetewî, zanîneke baştir ya qeneet û toreyan, hurmet ji bo pirrengîya bîr û bawerîyan û dewlemendkirina çandên hevdu”.

JÎYANA ABORÎ

12) Sazîyên netewî li ser mafên mensûbên hûrgelên netewî di warê kar û barên aborî de kê m sekinî ne. Lê belê, sazîyên navnetewî behsa mafê mensûbên hûrgelên netewî dikin ji bo karanîna zimanê xwe di warê umûmî (fermî) û şexsî de, bi serbestî û bê tu cudakarî, devkî û nivîskî, bi serê xwe û tevî kesên dinê. Benda 19(2) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 10(1) ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadiyên

Bingehîn, azadîya bîr û ray (ramanî) garantî dike, ne tenê ji bo dan û stendina fikr û bîr û bawerîyan bi kesên dinê re (ango di warê komînkasyonê de), lê her usa jî, ji bo ziman wek haletekî di warê dan û stendinê de. Ev heq, tevî heqê wekhevîyê û necudakarîyê, heqê mensûbên hûrgelên netewî îfade dike ji bo rêvebirina kar û meslegê xwe, bi zimanê ku ew hildibijêrin. Ji ber girîngîya dan û stendina mirovên mûteşebbîs bi miştêrîyên xwe re bi rehetî û ji bo ku bikaribin karên xwe di şertên baş de teqîb bikin, di hilbijartin û karanîna ziman de divê tu astengîya bê mane ji wan re neyê derxistin.

Benda 11(2) ya Peymana Çarçûve şert datîne û dibêje “hemû kesên ku mensûbê hûrgela netewî ne, heqê wan heye ku zimanê xwe yê hûrgelî di tabela, nivîs û di malûmatên dinê yê bi rengê şexsî de bi kar bînin ku ji umûmê re vekirî ye.” Di Peymana Çarçûve de ev gotina “bi rengê şexsî” wan hemû tiştên nefermî îfade dike. Bona vê yekê, divê Dewlet di warê hilbijartina ziman de ji bo rêvebirina kar û barên şîrketên şexsî, tu qeyd û şertan daneyne.

Tevî vê jî, Dewlet dikare bixwaze ku ziman –yan jî zimanên- fermî yê Dewletê di van cure kar û barên aborî de bi kar bînin, bi taybetî yê ku tesîra xwe li ser mafên kesên dinê dikin û ticaret û dan û stendina wan bi miqamên resmî re bin. Ev yek, ji Benda 19(3) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 10(2) ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn jî tê fêmkirin ku, di vî warî de hin sînoren caîz danîne. Dema behsa van hin sînoren caîz tê kirin, ku di bendên jorê de cî digrin, divê bê zanîn ku ew ji bo naveroka dan û stendinê (komînkasyonê) derbaz dibin, lê ne ji bo zimanê ku wek halet bi kar tê. Lê belê, parastina heq û azadîyên kesên dinê û daxwazên sînorkirî yê îdareyên resmî, dikare baş heq bide van talîmatên taybetî, ji bo ku ziman –yan jî zimanên- resmî yê dewletê jî tevî zimanê din bi kar bê. Ev yek dikare gor şert û mercan, di warên kar û xebatên sihhî û ewlekarîyê, parastina miştêrîyan, pêwendîyên karker û kardaran, beş û salmeyan, raporên finansê, sîgortaya sihhî û bêkarîyê û çûn hatinê ya Dewletê de bi cî bînin. Li ser bingeha mafê giştî ya makul, Dewlet dikare bixwaze, tevî zimanê ku bi kar tên, zimanê –yan jî zimanên- dewletê yê resmî jî di wan karên aborî de, wek îşaretên umûmî û etîketan de bi kar bînin, çawa di paragrafa 60 ya Rapora Agahdarîyê ya Peymana Çarçûve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî de hatiye tarîfkirin. Bi kurtahî, divê Dewlet tu car ne karibe karanîna zimanekî qedexe bike, lê bikaribe li ser mafê giştî yê makul, tevî wan zimanan, karanîna zimanê –yan jî zimanên- dewletê yê resmî jî bixwaze.

Bi mantiqê mafê giştî yê makul, hewcedarî –yan jî hewcedarîyên- karanîna ziman, ku dikare bi destê dewletê bê tanzîmkirin, divê bi nîsbet be bi mafê giştî ku tê parastin. Nîsbeta hewcedarîyêkê xuya dibe bi heya dereca ew çiqas zarûrî ye. Tevî vê jî, wek nimûne, di mafê giştî yê kargehên sihhet û ewlekarîyê de, Dewlet dikare ji karxaneyên şexsî bixwaze ku ew îşaretên ewleyî bi zimanê –yan jî zimanên- resmî yê dewletê jî daynin, digel ziman –yan jî zimanên- dinê ku bi alîyê şîrketê hatine hilbijartin û tene karanîn. Wekî vê, ji bo mafê îdareya umûmî ya dirist di warê beş û salmeyan de, Dewlet dikare bixwaze ku formên îdarî bi zimanê –yan jî zimanên- resmî yê Dewletê bin, da ku kîngê miqamên resmî li hesaban binêrin, divê qeyd her usa jî bi ziman –yan jî zimanên- resmî yê Dewletê bin; ev gotina dawî nayê wê manê ku şîrketa şexsî hemû qeydên xwe bi ziman –yan jî zimanên- dewletê bi cî bînin, lê tenê ew tiştên ku li ser şîrketa şexsî wek ferzên wergerandinê ne. Ev yek bi şîklekî bê teref, ji bo kargehên mensûbên hûrgelên netewî jî derbaz dibe, ku ziman –yan jî zimanên- xwe di warê dan û stendinê de bi miqamên îdarî re bi kar tînin, çawa di Benda 10(2) ya Peymana Çarçûve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî de hatiye nîşandan.

MIQAMÊN ÎDARÎ û XİZMETÊN DEWLETÊ

13/14/15) Dewletên Endam ên RPHE biryar dan ku tevdîran bistînin ji bo bî cîanîna rewşeke baş, ku ne tenê rê bide parastina nasnama mensûbên hûrgelên netewî (teví zimanê wan) lê her usa jî ji bo pêşveçûna wan. Wek netîce, van Dewletan soz dan ku “ji mafên mensûbên hûrgelên netewî re hurmet bikin di warê beşdarbûna wan di karên civakî de bi şiklekî xurt” çawa di paragrafa 35 ya Dokumentê Kopenhagê de hatîye nîşandan. Benda 10(2) ya Peymana Çarçuve ji bo Parastina Hûrgelên Netewî bi şiklekî zelal ji Dewletan dixwaze ku ew “tevdîran bistînin, da ku hûrgelên netewî bikaribin zimanê xwe bi dan û stendina bi miqamên îdarî re bi kar bînin.” Paragrafê 35 ya Dokumentê Kopenhagê, her usa jî behsa îmkana avakirina rewşeke baş dike ku rê bide beşdarîya hûrgelên netewî di karên civakî de, bi zimanê xwe, bi rîya avakirina “îdareyên xas yê herêmî yan jî xwemuxtar, gorî şertên dîrokî û herêmî yê hûrgelan, bi şiklekî hemahengî bi sîyaseta dewletên eleqeder.” Benda 15 ya Peymana Çarçuve dewletan îcbar dike ku ew “çi lazim e bikin, da ku mensûbên hûrgelên netewî bikaribin di jîyana çandî, civakî û aborî de û di karên civakî de, yê ku taybetî tesîrê li wan dikin, bi xurtî beşdar bin.” Ev şertên hanê miqamên îdarî bepirsîyar dikin ku îmkana bidine mensûbên hûrgelên netewî, da ku ew bikaribin bi miqamên herêmî re bi zimanê xwe bidin û bistînin, her usa jî, belgên medenî û testîqnameyan bi zimanê xwe bistînin. Ev şert her usa jî, li ser esasên wekhevî û ne cudakarî, beşdarî û têkilîyeke baş hewce dibînin, usa ku zimanê hûrgelê di jîyana sîyasî ya herêmî de û di navbera welatîyan û miqamên îdarî de, xizmetên îdarî ji di nav de, wek haletekî komînikasyonê bi her awayî temam bi kar bê.

Temsîla grûbên etnîkî bi alîyê sazî û ajansên îdarî yê ku ji bo xizmeta gel in, hebûna civakeke pirrengî, vekirî, û necudakar nîşan dide. Ji bo rakirina tesîra cudakarîya berê, yan jî ya heyî di sîstemê de, Benda 2 ya Peymana Navnetewî ya Rêxistina Kar No 111 di Heqê Cudakarî di Werê Kar û Mesleg de ji Dewletan dixwaze ku ew “sîyaseteke netewî bi rêve bibin ji bo... wekhevîya firsendan pêk bînin û bi adilî miamele bikin di warê kar û mesleg de, rê nedin tu cureyê cudakarîyê.”

Tiştêkî makûl e ku ji wan hukumetan -ewên ku esasên li jorê rêzkirî qebûl kirine- bê xwestin ku ew, dema bi hazirkirin û rêvebirina bername û kar-xebatên ji bo xizmeta gel mijûl dibin, daxwazên mensûbên hûrgelên netewî, bi taybetî li ser esasê hejmarekî makûl, bidin ber çavan. Li kîderê daxwaz hat nîşandan û hejmar jî têrê kir, edalet ev e ku, mensûbên hûrgelên netewî çawa ku beş û salmeyên xwe didin, divê xizmetan jî bi zimanê xwe bistînin. Ev yek bi taybetî di warê xweşî û xizmetên civakî de hewce ye, ku tesîra xwe yakcar û bi şiklekî bingeîn li ser jîyana mirovan dike.

Ji miqamên îdarî tê xwestin ku ew bi mensûbên hûrgelên netewî re , gorî esasên wekhevî û ne cudakarîyê, bi şiklekî baş û heqnas bidin û bistînin. Divê dewlet rastîyên demografîk (rewş û rengê nifûsê) qebûl bikin li herêmên ku tabîyê hiqûqa wan in. Berî her tiştî jî, divê dewlet ji berpirsîyarîya xwe nerevin bi rîya guhartina reng û rewşê nifûsa herêman. Bi taybetî Benda 16 ya Peymana Çarçuve, ji dewletan dixwaze û şert datîne ku ew, bi tevdîrên kêyfi nîsbeta nifûsê neguhurin li herêmên ku hûrgelên netewî lê dijîn, bi nîyet û armanca ku mafên hûrgelan kêmbikin. Îstîmlaka kêyfi, derxistina ji mal û erd, sirgûn kirin, her usa jî guhirandina sînorên îdarî bi şiklekî kêyfi û hijmartinên bi hîle, ji wan tevdîrên hanê ne.

SAZÎYÊN NETEWÎ YÊN SERBÎXWE

16) Mafên mirovî bi rastî bi cî tînin ji bo xwedî heq, kîngê miqamên resmî yê Dewletê mekanîzmeyekê ava bikin ji bo mafên ku bi peymanên navnetewî û daxuyanîyan, yan jî bi hiqûqa netewî hatine garantîkirin û wan bi xurtî bi cî bînin û biparêzin. Sazîyên netewî yê

serbixwe pêvajoya hiqûqî temam dikin û pirî caran mirov dikarin gelek bi rehetî, di demeke kurt de û bi mesrefeke kêr serî lê bidin.

Cudakarî, wekî di Peymana Nehîştina Cudakarîya Nijadî de hatîye behskirin, rasterast gor krîterê nijad ne hatîye bi navkirin. Benda 1(1) ya Peymanê şert datîne û dibêje ku mefhûmê cudakarîya nijadî mana “her cure cudakarî, redkirin (dervahiştin), dubendî kirin li ser esasê nijad, reng, malbat, koka bi alîyê etnîkî û netewî ye, ku armanc yan jî tesîra vî tiştî bêqîmetkirin yan jî xirabkirina rûmet, zewq yan jî hereket, pêwendîyên li ser wekhevî, ya mafên mirovî û azadîyên bingehîn e di warê sîyasî, aborî, civakî, çandî yan jî di warê dinê ya jîyana civakî de.” Benda 6 ya Peymanê dide xuyakirin û dibêje: “Dewletên terfê divê herkesê ku tabîyê hiqûqa wan e baş biparêzin û tevdiran bistînin bi rîya mehkemeyên netewî û sazîyên dinê yê dewletê, dijî her cureyê cudakarîyê ku mafên mirovî û ûzadîyên bingehîn paymal dikin û dijî vê Peymanê ne...” Bi vê wesîlê, avakirina sazîyên netewî yê serbixwe bi destê Dewletan, ku dikarin wek dezgeyên telafî û rastkirinê kar bikin, wek sazîyên ombudsman û komîsyonên mafên mirovî, pîvanê pirdengî û demokratbûna dewletan in. Digel vê, Konseya Ewrûpê, biryara Milletên Yekbûyî ya 48/134 ya 20 Sibatê 1993 wek çavkanî nîşan dide û bi Pêşniyarên Lîcneya Wezîran, No. R(97)14 ya 30 Îlon 1997, avakirina “Sazîyên Mafên Mirovî yê Netewî, bi taybetî komîsyonên mafên mirovî -ku di warê endametî de pirreng in- û ombudsman û sazîyên bi vî cureyî,” teşwîq dike. Dezgeyên hanê ji bo rastkirinê divê bi alîyê mensûbên hûrgelên netewî jî bikaribin bêne karanîn, ku dibêjin mafên wan ên zimanî û mafên dinê tene paymalkirin.

MIQAMÊN HIQÛQÎ

17/18) Hiqûqa Navnetewî ji miqamên resmî dixwaze ku dema kes hatine girtin, hatin sûcdarkirin û mehkemekirin, divê ew îddîyên di heqê wan de û hemû alîyên dewayê ji wan re bê îzahkirin bi zimanê ku ew tê digihîjin. Ger hewce be divê tercumanek ji bo wan bê karanîn, bêyî ku ew kes mesrefê tercumanê bidin. Ev tişt yek ji hewcedarîyên pêvajoya hiqûqê ye ku di warê navnetewî de li her derê derbaz dibe û pêwendîya xwe bi mafên zimanî yê hûrgelên netewî yê bi vî cureyî re tune. Serda jî, ev esasên hanê yê wekhevîyê û necudakarîyê ne di warê hiqûqê de. Hurmet ji van esasan re, bi taybetî di warê îtham û mehkemeyên curmî de gelek mihîm in. Bona vê yekê, Benda 14(3) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî daxwaz dike ku, herkesê ku bi curmekî tê sûcdarkirin, divê di zûtirîn dem de û hûr hûr bê haydarkirin di heqê sebebê sûcdarkirinê de, bi zimanekî ku ew jê fêhm dike. Benda 6(3)(a) ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn jî eynî tiştî şert dibîne û hema hema bi eynî gotinan dibêje. Tevî vê jî, Benda 5(2) ya Peymana hanê eynî daxwazê ji bo halê girtinê jî dike. Her usa, Benda 14(3) Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî dibêje ku heqê hemû kesan “bi temamî wekî hev e”... di warê “(e) îfade girtin û danê, şahidên dijî wî û yê ku ew ji bo parastina xwe nîşan dide, di eynî şertan de (yek miamele dibînin).” Bi vê wesîlê, Benda 14(3) ya Peymana Navnetewî li ser Mafên Medenî û Sîyasî û Benda 6(3) ya Peymana Ewrûpê ji bo Parastina Mafên Mirovî û Azadîyên Bingehîn heqê herkesî garantî dikin ji bo “alîkarî ji tercumanekî bigre bi şiklekî bê mesref, eger ew kes nikare zimanê ku di mehkemê de bi kar tê fêhm bike û qîse bike.” Herçiqas ev garantîyên hanê bi şiklekî eşkere ji bo karanîna ziman in bi taybetî di dewayên curmî de, ew ji heq û garantîya bingehîn ya wekhevîyê li pêş mehkemeyan dertên, çawa di Benda 14(1) ya Peymana Navnetewî li Ser Mafên Medenî û Sîyasî de wek şertekî hatîye danîn, da ku dewayên yasayî yê her cureyî, çiqas îmkan hebe di şertên baş de û li ser esasê wekhevîyê pêk bên. Ev şert, ku wekhevîyê hewce dibîne ji bo hîlbijartina ziman di pêvajoya dadigehê de, her usa jî ji dewletan re rê nîşan dide di pêşvebirina sîyaseta xwe de ji bo rêvebirina hiqûqa xwe li ser esasê wekhevîyê bi şiklekî baş.

Bi awayekî giştî, Benda 7(1) ya Senedê Ewrûpê ji bo Zimanên Herêmî yan jî Hûrgelî beyan dike ku, divê Dewlet sîyaset, yasa (qanûn) û pratîka xwe li ser bingehe hedef û esasên hanê ava bikin, wek “zimanên herêmî yan jî hûrgelî wek pirrengî û dewlemendîyeke çanda welat qebûl bikin...” û “ji bo parastin û pêşvebirina zimanên herêmî û hûrgelî kar û xebateke berbiçav bikin.” Benda 7(4) ya Senedê Ewrûpê dibêje: “Dewletên teref dema sîyaseta xwe di heqê zimanên herêmî û hûrgelî de rast dikin,... divê daxwaz û pêşniyarên grûbên hanê jî, ku wan zimanan qise dikin, bidine ber çavan.” Her usa jî, Benda 15 ya Peymana Çarçûve, dewletan îcbar dike ku ew “tevdîran bistînin û çî lazim e bikin, da ku mensûbên hûrgelên netewî di jîyana çandî, civakî û aborî û karên civakî de, yê ku bi taybetî wan eleqeder dikin, bi şiklekî baş beşdar bin. Dema mirov girîngîya pîvanên jorê bide ber çavan, di civakên demokratîk de, ji bo bi cîhatina edaletê bi şiklekî baş, rayeke makûl e ku ji dewletê bê xwestin, çiqas îmkan hebe heya wê derecê, ji mafê hûrgelên netewî re di warê karanîna zimanê xwe di hemû qonaxên dewayên hiqûqê de (çî cezayî, çî medenî û îdarî) hurmet bike û îmkan bide, tevî ku hurmeta heqê kesên dinê jî bike û -dereca temyîzê jî di nav de- yekîtîya pêvajoyê biparêze.

19) Bi cîhatina edaletê ji bo feydekirina ji mafên mirovî heya çî derecê mihîm e, ji bo kesan beşdarbûneke rasterast û hêsan di vê pevajoyê de jî ewqas mihîm e. Ji bo mensûbên hûrgelên netewî, karanîna zimanê xwe di van pêvajoyan de, ji bo wan bî cîhatina edaletê gelek hêsantir dike.

Li ser vê esasê, Benda 9 ya Senedê Ewrûpê ji bo Zimanên Herêmî û Hûrgelî şert dibîne û dibêje ku, heya çî derecê îmkan hebe û minasiw be, gor daxwazên kesên eleqeder, divê hemû miameleyên hiqûqî di zimanên herêmî û hûrgelî de pêk bên. Parlamentoya Konsaya Ewrûpê di Benda 7(3) di biryara xwe ya 1201 de giha wê netîcê ku, “li herêmên ku hûrgelên netewî bi hejmareke mihîm lê dijîn, li wir heqê mensûbên hûrgelên netewî heye ku bikaribin zimanê xwe yê dayik di pêwendiyên bi miqamên îdarî re bi kar binin li pêş mehkemeyan û miqamên yasayî de. Digel vê jî, divê dewlet di warê hiqûqê de tevdîrên minasiw bistîne û sîyaseteke baş bide pêşîya xwe ji bo karên perwerdeyî.

MEHRÛMBÛN JÎ AZADÎYÊ

20) Qeyde 51, paragrafên 1 û 2 ya Pîvanên Qeydeyên Kêmtirîn (asgarî) yê Milletên Yekbûyî ji bo Miamele bi Girtîyan re, her usa jî Qeyde 60, Paragrafên 1 û 2 ya Qeydeyên Hepisxaneyên Ewrûpê yê Konseyên Ewrûpê dibêje ku, mihîmîya mafê hepsîyan divê bê fêmkirin bi alîyê îdara hepisxaneyan, her usa jî, mihîmîya ji bo îdareya hepisxaneyan divê bê fêmkirin bi alîyê girtî û mehkûman. Ev hukum ne tenê ji bo mafên hûrgelan e. Lê belê, dema ku daxwazên xelkê eleqeder û giraniya hejmarê wan û esasên wekhevîyê û necudakarîyê li ber çavan bê girtin, hingê ev hukmên hanê hîn zêdetir îcbarî dibin li herêm û mehelên ku li wir mensûbên hûrgelên netewî bi hejmareke baş dijîn.

21) Qeyde 37 ya Pîvanên Qeydeyên Kêmtirîn yê Milletên Yekbûyî ji bo Miamele bi Girtîyan re, her usa jî Benda 43(1) ya Qeydeyên Hepisxaneyên Ewrûpê yê Konseyên Ewrûpê, dan û stendina girtîyan bi malbatên xwe re, heval û kesên muhterem re, yan jî nûnerên rêxistinên derve re heq dibînin. Bi alîyê mihîmîya mafên mirovî yê hanê, wek azadîya bîr û ray û heqê axaftina zimanê xwe di warên şexsî û fermî de, miqamên hepisxaneyan mecbûr in van heq û azadîyan re hurmet bikin, heya di hepisxaneyên ji bo cezayên giran de, gor qeyd û çarçûveya ku qanûnê danîye. Wek qeydeyekî, divê hepsî bikaribin bi zimanê xwe him bi devkî, bi hepsîyên dinê û bi zîyaretvanan re, him jî bi nivîskî di nameyên şexsî de bi kar binin. Lê belê,

hin mafên mirovî û azadîyên taybetî yê wan kesên ku ji ber curmekî hatine girtin, dikare bi şiklekî makûl bê sînorkirin yan jî bo middekekî bê sekinandin ji bo sedemên ewleyîya civakî, gor çarçûveyên ku di sazîyên navnetewî de hatine danîn. Wek pirseke pratîk, îstîfade ji mafên zimanî ji bo hepsîyan dikare gelek hêsantir be, bi çikirina wan li herêmeke ku zimanê wan tê qisekirin.
